gername

HESENÊ METÊ

# Başûrê Kurdistanê

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

# Başûrê Kurdistanê

# Başûrê Kurdistanê

**HESENÊ METÊ**

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Hesenê Metê:** Başûrê Kurdistanê

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Hesenê Metê û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Başûrê Kurdistanê

Ji haziran ne çêtir, ez û dostê xwe î hêja, Elî Çiftçî ne. Lê anuha dema ko ez van rêzan reş dikim, divê ez rengdêra wî ya pîroz jî bi navê wî ve bikelînim û bibêjim hecî Elî Çiftçî. Ez ê dû re ji we re bi lêv bikim ka wî û bêguman min jî kengî xwe gîhand merteba vê rengdêra pîroz, bi gotineke din, rengdêra hecîtiyê. Belê, min got ez û wî ne, em bi hewa dikevin û berê me li Şama Şerîf e. Li jor, li asimanan şeva roja 25an li me dibe roja 26an.

Saet li duduyê şevê em serejêrî erdê dibin û germa Şama qedîm tavilê bi me dide zanîn ko em li erdekî din dahatine. Li gel brokrasiyeke navno jî em ji deriyên balafirgehê derbasî der dibin û germeke xurt li me vedinişe.

Xwedê jê razî, bi edet û marîfetên kurdên binxetî Zeredeşt û dostekî xwe hatine pêşiya me. Wê şevê di otêla Karawan de em serê xwe didin ser balîvan û ro li me bilind dibe. Ji bo karê xwe yê çûyînê divê em biçin buroya hukumata Kurdistanê û em welê jî dikin. Zeredeşt jî bi me re ye. Li wir, li buroyê bi qedir û qîmet em rastî kek Remezanê nexşîn tên. Nexşîn dibêjim... kek Remezan navsereyekî şîrîn e. Piştî xêrhatineke germ em pê didine zanîn ko em ji kuderê hatine û em ê bi kuderê de biçin. Dosiyereke tijî kaxiz û faksên fermî ji refikekê dadixe, datîne ber xwe û ji min re dibêje:

— Navê te bi xêr, ji kerema xwe re ka pasaporta xwe?

Ez pasaporta xwe didime wî û dibêjimê:

— Xêra Xwedê li cenabê te... navê min, ev navê li pasaportê ye.

— Himm... dibêje, li pasaporta min dinêre, kaxizên di dosiyerê de di ser hev de diqulibîne û di wê gavê de telefonek jê re tê. Bi serbilindiya karmendekî radihêje telefonê û li hev dipirsin... Di telefonê de pirsa wî û çend kesên din jî dike, li rewşên wan dipirse, henekan dike û dikene. Piştî demeke ne kurt telefonê datîne û dîsa li navê min dipirse. Ez dîsa navê xwe jê re dibêjim. Du tiliyên destê xwe î rastê bi zimanê xwe şil dike û dîsa bi nav kaxizên dosiyerê dikeve. Ez bi xwe nizanim ka ew li çi digere û çi nabîne. Li min vedigere û dibêje:

— Tu xelkî kîderê yî, bira can... dibêje, ev navê te... navê dê û bavê te jî li virê ne diyar e.

Ez dipişirim û dibêm:

— Ez xelkê Diyarbekirê me, can... û ev hevalê min jî ji kurdên Anatoliya Navîn e. Di pasapaortên me de navê dê û bavan tuneye, rast e.

Kêfxweşî li ruyê wî diyar dibe ko em kurdên bakur in. Bi çavên du mêvanan li me mêze dike. Ez bawer im ji ber evê yekê ye ko ew careke din xêrhatinê li me dike. Dû re bi dengekî banî çaygerê xwe dike ko ji me re ava sar û çayê bîne. Bi zarxweşî ji min re behsa xwe û pêşmergetiya xwe dike. Carekê li hêla Şirnexê hatiye girtin, leşgerên tirkan ew li erdê dirêj kirine, bi keviran li ser pişta wî dîwar lê kirine, gelekî hov û zalim bûne, heşt mehan di hundur de hiştine... piştî vê serpêhatiye xwe vedigere ser min û dibêje:

— Baş e, navê bavê te.

— Navê bavê min Fêzo.

— Û navê diya te?

— Heca Bêzo, dibêjim... li Stockholmê jî me welê faksî vir kiriye. Divê li van kaxizan hebe, dibêjim.

Çay tê, li me û wan kesên wir belav dibe û ew jî hêj li nav kaxizên dosiyerê li me digere. Ji çayger re dibêje:

— Pencerê veke.

Çayger welê dike. Telefoneke din tê... û ew dîsa dest pê dike û bi şêweyekî kurmancî diqedîne, dixwazim bibêjim dirêj dike. Dû re vedigere ser min û dibê:

— Te got navê dê û bavê te çi bû?

— Navê bavê min Fêzo û navê diya min jî Heca Bêzo... weke gotinên sitranekê ye... lê navê dê û bavê min wusa ye, dibêjim û dipişirim.

Mîna ko bibêje ma wekî din nav tune bûn, bi pişirîn li min dinêre û dîsa li nav kaxizan digere. Li min digere, li diya min digere, li bavê min î rihmetî digere.

Bi awayekî rengîn em karê xwe î formel û brokratîk diqedînin. Em derdikevin û em ê dîsa dakevine nava bajêr û werin otêla Karawanê. Lê di rê de ji Zeredeşt dixwazim ko berê me bide Taxa Kurdan, goristana Mewlana Xalidê Nexşîbendî, ez jê daxwaz dikim ko em biçine ser gorna Mîr Celadet û mala Bedirxaniyan.

Royê xwe havêtiye paş çiyayê Taxa kurdan. Bi êvara teng re em xwe digêhînin goristanê û belekiya mekanê mala Bedirxaniyan tavilê bi min


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dide zanîn ko ev mekanê bi kevirên reş û sipî, mekanê wan e. Meriv zû têderdixe ko ev mekan nîşana Birca Belek û yên tê de jî ji mîrên Botan e. Piçûk e, çarmedorî mekan bi qasî duwanzdeh mîtroyan e. Xwe bi xwe: »Xwedêyo,« dibêjim, »hukmê mîr û mîrekiya Botan çiqas guvişiye ser hev û piçûk bûye!« Bêyî ko li ser bifikirim bi herdu destan fatîhayeke erebî dixwînim (fatîheya ko ez hîn jî nizanim bê maneya wê çi ye) û di ser Bedirxan Begê botî de dirijînim. Nizanim çima lê di wê gavê de hîseke welê li min çêdibe ko ew el-fatîheya erebî ji bo Mîr Celadet Bedirxan çênabe û ez jî nakim, ez fatîheyê bi lêv nakim. Ez difikirim û di dewsa el-fatîheya erebî de di dilê xwe de dibêjim: »Yezdanê pak û dilovan ciyê te fere bike û koşkek kesk bike para cenabê te, Mîrê min.« Û ji bo Rewşen xanimê jî... li vir divê ez li xwe mikûr werim ko ne bi erebî û ne jî bi kurmanciya reş… ez gotinan ji bo vê xatûnê nabêjim, lê tenê dikevim ramanan. Ez difikirim û xwe bi xwe dibêjim: »Ez nizanim Rewşenxan, ez nizanim gelo te ji rojan rojekê dilê Mîr Celadet Bedirxan şikand û te cenabê wî eciz kir, an ne? Xwezî di saxiya te de min jî xwe bigîhanda te û kevneşekaleke Mîr ji te bixwesta. Lê ez li ser evan kevirên mekanê gornên we sond dixwim ko min ê ew şekal bi ser lingên xwe ve nekira û min ê negota: şekalên min e. Min ê bigota şekalên Mîrê min e. Dû re min ê bizmarekî zengalî ji ewan şekalan rakira, min ê benek bavêtayê û weke xaça Mesîh bi hustuyê xwe de bikira û heta roja mirinê jî min ê bi xwe re bigeranda. Wek ko min got, li her deverê jî min ê bigota ev şekal, şekala Mîr e… min ê bigota, min ji Rewşenxanê girtiye. Sond dixwim û careke din dibêjim ko ez ê li şekalê xwedî derneketama û min ê negota ev şekal, şekala min e... te got erê, Rewşenxan!«

Di wê gavê de hîseke seyr girtiye ser min. Ji min wetrê ez cenabê Mîr pir ji nêzîk ve nas dikim, ji min wetrê ew jî ji deverekê min nas dike. Xwîna min lê dikele û kêla gorna wî min ber bi xwe dikêşe. Di dilê xwe de: »Mîrê min,« dibêjim, »wek ko min got, va ye ez hatim, ez... ez im Mîrê min. Nizanim tê bîra te an ne, wê şevê... şeva ko Darînê Daryo* rabû dûrûdirêj Êşa xwe ji te re vegot, ez... ew î ko wê şevê, piştî wê çîrokê bi Darînê Daryo re serê xwe da ser balîvekê û kete xewê... belê, min got, ez ew im, ez ew kes im, Mîrê min.« [*Darînê Daryo lehengê çîroka *Êşê* ye ko Hesenê Metê nivîsiye. Di çîrokê de Darînê Daryo bi portreyê Mîr re dipeyive, derd û kulên xwe jê re vedibêje. Nefel]

Û wê şevê em berê xwe didin bakûr û bi rohilata 27ê mehê re em digêhîjin Qamîşloyê. Li termînala otobusan em dadikevin û em xwe di

nav lepên şofêrên texsiyan de dibînin. Ji şofêran yek bi milê min digire û dikêşe, û yekî din jî tevî çentê me hecî Elî Çiftçî ber bi texsiya xwe radikêşe. Herdu jî xort û bi salên xwe ji me piçûktir in. Ez bi pişirîn li şofêran vedigerim û dibêjim:

— Çênabe, em her yek bi aliyekî ve naçin. Em herdu jî diçin derekê, bi qurbana we!

Ji şofêran yek li yê din vedigerîne û dibêje:

— Evana mêvanê min in, ez hatime pêşiya wan.

Hecî Elî Çiftçî jî welê bawer dike ko Ferhad Çelebî ew şandiye pêşiya me. Ji bo me ne xem e ko kî ê me bibe nava bajêr, lê ez dizanim ko em ne mêvanê ewî şofêrî ne û Ferhad Çelebî jî ew ne şandiye pêşiya me. Tiştê herî xweş ew e ko herdu şofêrên xort jî bi hev re û bi me re bi kurmanciyeke malê dipeyivin. Baş e, dibêjim û em xwe bi dest şofêrekî ve berdidin. Lê hecî Elî Çiftçî hîn jî welê bawer dike ko Ferhad Çelebî şandiye pey me. Di texsiyê de şofêrê xort ji me dipirse ka em ê bi kuderê de biçin. Bêyî ko zêde bifikirm, zû û bi awayekî pir normal:

— Mala Ferhad Çelebî, dibêjim, ma em ê wekîdin bi kuderê de biçin?

Şofêrê me î xort li me vedigerîne û dibêje:

— Mala Ferhad Çelebî li kuderê ye?

— Nizanim, dibêjim, ma ne ewî tu şandiye pêşiya me, te welê got?

Bêyî ko bersiva pirsa min bide, dibêje:

— Êê... ko hûn bizanin, mala wî li kuderê ye, ez ê we bibim wir.

Vê carê bi ken lê vedigerînim:

— Nizanim, dibêjim, te ji şofêrê din re got ko em mêvanê te ne û tu hatiye pêşiya me.

Li ser evê gotina min, ew jî dikene û ez ji hecî Elî Çiftçî dixwazim ko ew telefonekê ji Ferhad Çelebî re veke. Hecî Elî Çiftçî welê dike, mobîla xwe bi Ferhad Çelebî re dipeyive û dû re telefonê dirêjî şofêrê xort dike. Şofêr, me heta ber deriyê mala Ferhad Çelebî dibe û em pereyekî li gor dilê wî didine wî.

Pêşiyê di germiya Qamîşloyê de û dû re jî em xwe di nav germiya nas û dostên binxetê de dibînin. Ji haziran ne çêtir, binxetiyên me weke xwî û marîfeta xwe ya binxetî hertim merva û xwîngerm in. Di van du rojan de em diçin mala Konê Reş jî. Di ewê germê de, li eywana malê pêşiyê em avekê û dû re jî em çayekê di gewriya xwe de berdidin û dû re jî hûn dizanin: cixare... dema ez dûyê cixara xwe ber bi jor dişînim, di wê gavê de awurên min li dîwarê odê asê dibe, dîwarê ko serê xezalekê tev


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

şivedareke hespê pê ve dardekiriye. Li ser evê yekê Konê Reş berê xwe dide min û bi serbilindî dibêje:

— Ev serê xezalê ji nêçira cenabê Mîr Celadet Bedirxan e. Ewî bi destê xwe nêçira vê xezalê kiriye... nêçira rihmetî ye.

Bi van gotinên Konê Reş re heta çend hilmên kwîr jî ez çavên xwe ji wê nêçira Mîr nakutim û pê re dûr diçim. Dema ko ew van gotinan dibêje jî, wek ko min got, pir serbilind e, serbilindî jî ew e ko ji bermayên mîrê Botan tiştek li mala wî jî heye. Dû re dixwazim wî serwext bikim ko ciyê parastina bermayên nêçira Mîr û gelek tiştên din, ne mala min û wî ye. Divê li ciyekî ewletir bêne parastin ko bimînin. Weke manewiyeta xwe ev tişt ji bo me giranbuha ne. Dû re vedigerime ser Konê Reş û ji dilekî pak dibêjimê:

— Dîsa jî mala te ava, ya ciwamêr. Ko te anuha rabûya û bigota ev serê xezalê ji nêçira min e… û te bigota min bi destê xwe ew kuştiye, me ê çi xwelî li serê xwe bikira!

Kenekî hûr bi civata me ya hazir dikeve. Lewra ew jî dizanin û bihîstine ko di roja îro de hinek kesan dest danîne ser bermayên Mîr û li ser rûniştine. Lê ez naxwazim ew zêde bikenin. Dîsa vedigerim ser Konê Reş û dibêjimê.

— Lê dîsa jî xwelî li serê binxetiyan! Me serxetiyan… me Mîrek, me malek û me dîrokeke serxetê sipart bextê binxetiyan, lê nikanî bûn xwedî lê derketana! Li cenabê Mîr Celadet Bedirxan xwedî derketin, lê ne li tiştên wî. Ji bilî evî seriyê xezala ji nêçira wî… de ka çiyê wî maye, Konê Reş? Ma çêdibe ko çakêt û qapûtekî kevin ji ber kincên wî ne ma be, ma çêdibe ko derpê û kirasekî wî, şekal û gopalekî wî, wêne û nexşekî wî, defter û nivîseke wî, qelem û karekî wî ji ber jiyana wî ne ma be! Na ezbenî, na... hûn binxetî germ û merva ne, lê di evê yekê de we sistî kiriye. We bermayên Mîr ne parastine, bi awayekî pêwîst we xwedîtî li bermayên cenabê wî ne kiriye. Lê divê hûn welê bizanin ko ji ber evê sersariya we binxetiyan, ne dîrok û ne jî Xwedê we efû dike. Nifşên li dû me bi serê xezalekê têr nabin, ya Konê Reş, ew ê gelek tiştên din jî bixwazin.

»Tetz Rooke î hêja!

Ji bo karê wergera niviskarê xwe, te kinc û şekalên xelkên welatê wî li xwe kir ko tu xwe di atmosfera niviskar de bibînî û welê wergera berhema wî bikî. Ez pîroziya kar û kerametê te fam dikim. Lê ez xwe fam nakim, Tetz Rooke. Ji ber ko ne weke wergerekî, lê ez wek xwendevanekî

normal bi şopa niviskarên xwe ketim û heta bajar û gundên wan çûm. Bi gotineke din, bi çolên Amûdê û bi gotina niviskarên xwe ên ezîz, ez bi toza Amûdê ketim. A ew toza Amûdê min ber bi xwe dikêşe û ez diçim. Çi hîkmet e, çi qudret e ko min ber bi wir dikêşe ez nizanim, lê wek ko min got, ez jî wekî te… lê dîsa jî ne wekî te ber bi wir diçim.«

Li Girê Mozan digerim û têm li ber Girê Şeremola disekinim. Ji dostên dora xwe re: »Na, dibêjim, çênabe ko ev Girê Şeremola be. Min di pirtûkan de xwendiye, min di helbest û çîrokan de xwendiye û li wir, di nivisên wan de min Girê Şeremola dîtiye. Girê Şeremola divê bi qasî çiyayê Qertewînê bilind be. Ev çi ye, dibêjim, sergoyên li ba me jî ji evê xweliyê bilintir e.«

Piştî ez serwext dibim ko ev gir bi rastî jî Girê Şeremola ye, girê ko di çîrok û helbestan de hatiye vegotin, li xwe matmayî dimînim û ji wan dostên dora xwe re dibêjim. »Anuha ez baştir bi qudreta gotinan, gotinên niviskaran hesiyam. Ez ji Diyarbekira reş im, bedena dorê li ser heyştê û du bircan e, duwanzdeh mîtro bilindî û bi qasî pênc hezar gavên mêrane dirêj e. Lê gotinên niviskaran ev Girê Şeremola ji ewê bedenê jî berztir kiriye.«

29ê mehê ye. Em ji Qamîşloyê heta ber devê şetê Cizîra Botan, ber bi rohilat diçin. Em li ber devê avê ne. Em li vî aliyê avê ne û aliyê din î avê jî bi me ve xuyaye. Li wê hêla avê komek leşgerên kurd, ji avahiyên gumrika derê welêt dûr hatine û li ber devê avê dipên. Tîna miqedesiya navê Kurdistanê ji wî aliyê din dide me û şewateke hesreta navekî welê li hestiyê lûtê me dide der. Di wê gavê de ez baştir serwext dibim ko tiştekî bi navê bihiştê tuneye. Hebûna tiştekî welê ne bûye.

Dibêjin ko bihişt tune bûye û tiştekî welê jî tuneye. Rîwayet dibêjin dema ko Xwedê hezretî Adem ji axê çêkir û piştî gunehkariyê ew ji Baxê Edenê dûrxist, rabû heta ko mir jî ne hişt hezretî Adem careke din li wê axê vegere. Piştî demekê hezretî Adem bi hisreta axa xwe bêriya wî erdê xwe kir. Bi gotineke din, ew erdê ko Xwedê ew jê çêkir. Hezretî Adem ewqas bêrî kir û ewqas bi nexş û xweşikiyan nîgara wî erdî kir ku... ev nîgara bêrîkirina wî, di serê nifş û neviyên piştî wî de, nefs û navekî bihiştê girt. Ew welê pê jiya û welê jî mir. Ji wê rojê û pê ve navê bihiştê di nava nifşên piştî wî de belav bûye û îro jî her welê ye. Û ev dîtin, dîtina ko dibêjin bihişt tuneye... wek ko min got, anuha ez baştir têdigêhîjim. Raman û hîsên ko me ber bi vê axa me ve dikêşîne jî… ez bawer im ev


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

yeka ha ye. Axa me bi min û ez welê bawer dikim ko bi hecî Elî Çiftçiyê dostê min jî weke bihiştê dixuye û em ê jî biçine wir. Li ber devê avê problemeke brokratîk derdikeve, Ridwan* an jî mixaberatên xêrnexwaz nahêlin hecî Elî Çiftçiyê dostê min têkeve bihiştê. Li gor karmendê mixaberatê li ber devê avê, navê hecî Elî Çiftçî di defterê de tune bûye. Li ser vê yekê jê re dibêjim: »Ez ê li hêla hundur li bendî te bisekinim, tu jî vegere û here navê xwe di defterên ereban de bibîne û vegere. Ko tu venegerî ez ê telefonê Qamîşloyê jî bikim.« [*Rîwayet dibêjin melekê li ber derê bihiştê bi navê Ridwan e. Nefel]

Hecî Elî Çiftçî vedigere. Em rêwiyên mayî, em bi kelekeke piçûk derbasî hêla din dibin, hêla ko me got bihişt, me got Kurdistan. Em bi qasî bîst rêwiyan in. Jin hene, zarok hene, keç û xortên xama û kesine salmezin hene, soran hene, kurmanc hene… Nizanim çima, lê ew î ko pêşiyê li kelekê siwar tê, ez im. Ez û rêwiyên din, em bi kelekê li ava şetê Cizîrê dikevin. Kelekvanên me jî ji kurmancên hêla bihiştê ne. Şet fere û bi rengekî keskeşînekî vekirî ye. Bêdeng û boş diherike. Ne zêde babetekî ewle ye ko meriv bi kelekên weha li aveke welê bikeve û derbasî hêla din bibe. Lê di rewşên weha de… meriv hertiştî dide xatirê nav û axa Kurdistanê. Min got, zarok jî hene, di wê gavê de du zarokan di çav xwe re dikim, difikirim û xwe bi xwe dibêjim, » Ji van deran dûr! Xwedê neke kelek biqelibe û zarok têkevine avê, ez ê wan çawa xelas bikim?« Ez didime bala xwe ko ez ê bikanim tenê yekî xelas bikim. Li gel van ramanên xwe î kambax, em ber bi qeraxê hêla din diçin. Lê hêla din... wek ko min got, ez nizanim çima lê yê ko pêşiyê dadikeve jî, dîsa ez im. Ez ji kelekê dadikevim, lingên min bi erdê dikeve û bi qasî coşa evê avê, çoşek di ruhê min de dilive û ez jî baş hîs dikim. Ji wê koma leşgerên kurd, leşgerên ko li ber devê avê li bendî me ne, du kes weke şêran ber bi pêş tên û bi qasî sê werîsan ji devê avê dûr disekinin. Ji wan yek dengekî li min dike… wek ko min got berî herkesî ez dadikevim. Ew ji min re dibêje:

— Ji kerema xwe re, bira can... ji kerema xwe re çentên xwe li wir dayne û wereqa navê xwe bîne!

Bi bihîstina evan gotinên leşger re di dilê xwe de: »Ez bi qurbana ewî dengê te bim!« dibêjim û di wê gavê de hîseke seyr li min radibe. Heta nuha min ji leşgeran hez ne kiriye, min ji rengê kincên wan hez ne kiriye, min ji sîlehên wan hez ne kiriye. Hîn jî tênagêhîjim çima, ew rengê kincên wan, ew sîlehên li milê wan, ew bejn û bala leşgeriya wan û ne-

maze ew fermana wan a bi kurmancî... ev hemî tişt li min dibe bawerî, li min dibe hêz û xurtî, li min dibe serbilindî... bi serbilindî ez çentê xwe datînim û bi gavên ewle û aramî ber bi wan diçim. Dixwazim fermana wan bi cî bînim. Wek ko min got, navîna min û wan du leşgeran bi qasî sê werîsan e. Lê di wan gavên di navîna min û wan de, di wê dema kurt de ew hemî şehîdên ko ji bo erdekî welê ketin û eniyên xwe dan axa sar... ew hemî keç û berzewacên ko ji bo navekî welê ji keçaniya xwe bûn û xwe di zinaran werkirin... ew hemî dengbêjên ko ji bo dar û kevîrekî welê destan gotin û çûn... Xwedêyo, a ew hemî maqûl û hêjayên kurd li ber çavên min peyda dibin, coşa dilê min berz û tije dibe, gewriya min tije dibe, çavên min tije dibe û heta ko ez di wan çend gavan de xwe digêhînime nik wan leşgeran, av di çavên min de nahewe û tê xwarê. Yek bi yek ez wan herdu leşgerên kurd hemêz dikim, bi defa sîngê xwe ve dişidînim, eniya wan maç dikim û wekîdin... wekîdin tenikiya dilê min, ava çavên min rê nade min ko ez navê xwe î li ser wereqa xwe ji wan re bi lêv bikim. Tenê tiştekî dikim, wê perçekaxiza navê xwe, bi gotina wan, ez wereqa navê xwe dirêjî wan dikim û hew.

Leşgerên kurd têdigêhîjin û Xwedê dizane di jiyana xwe de ev cara yekem e ko ez dibînim va ye leşgerên têgêhîştî jî hene. Belê, têdigêhîjin, dikevine milên min, min dibin binê siya kepira xwe, li ser kursiyekê cî didine min:

— Bêhna xwe fere bike, bira... şikir ji Xwedayî re eve tu hatî axa xwe, tu ê biçî gundê xwe, tu ê dê û bav... tu ê xizm û nasên xwe bibînî, dibêjin û dixwazin kela dilê min daxînin.

Ez xwarî erdê dibim, radihêjim kevirekî didim ser eniya xwe û li ser kursiya binê siya kepirê cixareyekê agir dikim. Ew çend rêwiyên din karê nav û kaxizên xwe diqedînin û ber bi jor, ber bi lojmanên deriyê gumrika welatê me diçin. Piştî çûyîna wan rêwiyên din, herdu leşgerên kurd vedigerine ba min. Di kişandina cixara xwe ya duduyan de, deng ji min derdikeve û bersiva leşgerên xwe didim. Ji wan yekî tenik î dirêj ji min dipirse û dibê:

— Tu ji kîderê yî, bira?

Ez baş dizanim ko qesta pirsa wî Dehok, Zaxo an jî gundekî ji wan doran e. Ez jî bersivê didim û dibêjime wî:

— Ez ji hêla bakur, ji Diyarbekirê me, can.

Piştî ko ew têdigêhîjin min ne dê û bav, ne jî xizm û nas li vî aliyî hene, wê çaxê bêtir li rewşa min germ dibin, ew jî qedir û qîmeteke bêtir didine


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vê diltenikiya min û em bi hev re dikevine galegalan, galegalên ji wê havînê jî germtir.

Li jora devê avê, li lojmanên deriyê gumrikê karê min çêdibe, çay û xwarin tê ber min û … de vêca bifikirin… ez û karmendên gumrikê bi hev re li ser xwarinê rûdinin û em bi hev re dixwin. Ez rewşa hecî Elî Çiftçî ji wan re vedibêjim û li wir li bendî wî disekinim. Ji min dipirsin ka ez ê li kuderê bigerim û heta kuderê biçim. Ez jî ji wan re bi lêv dikim û dibêjim:

— Heta wan ciyê ko kurd xwediyê hukum in... ez ê heta Silêmaniyê biçim û bigerim.

Piştî saetekê ji wan xatir dixwazim ko ber bi Dehokê bilezînim. Difikirim ko xwe bigêhînim otêlekê û ji wir ji dostên Qamîşloyê re telefonekê bikim û bibêjim: »Hecî Elî Çîftçî bi şûn de vegeriya, bi tenê nehêlin.« Wek ko min got, tevgerên karmendên gumrikê li hemberî min ji tevgerên karmendan bêtir e, mîna ko ez ne tenê tûrîst an jî welatiyekî wan im... germî û nêzîkiya wan ji evan xisûsiyetan gelek û gelekî bêtir e. Ez çi dibêjim, çi daxwaz dikim weke min dibe, bi gotineke din problem dernakeve, bi marîfet û bi hurmet in.

Bi alîkariya karmendan ez sed dolarekî xwe dikim desteyeke dînar, li texsiyekê siwar têm û ji şofêr re dibêjim: ji kerema xwe re bajo Dehokê. Ez û şofêrê xwe di riya Dehokê de ne. Şofêr torkman e, ew wusa dibêje, lê bi kurdiyeke paqij dipeyive. Di rê de, ez dilê wî nizanim, lê di sohbeta me de ez têderdixim ko ji hukmat û îdara Kurdistanê kêfxweş e. Hawurdor germ e. Germeke welê ko meriv dibê qey meriv li ser sêlê ne. Beriya ko em bajon ber deriyê otêla Sûlavê, ez dixwazim bi şofêrê xwe re xwarinekê jî bixwim. Em li ber aşxaneyekê radiwestin û dikevine hundur. Hênik, modern û bêhna xwarinên xweş tê. Piştî xwarinê em tên Sûlavê.

Li Sûlavê, beriya ko ez ciyekî veqetînim, dinêrim ko hecî Elî Çiftçî li pişt min e. Ew tiştên ko di dilê min de dibêje: dibe ko li hêla Suriyê ew bêbavên mixaberatan hecî Elî Çiftçî bernedin, ew hustuxwariya min a li ser evê yekê li min wenda dibe û kêfxweşî li min diyar dibe. Em odeyekê vediqetînin, em derdikevin jor, otêl modern e. Em avekê li xwe dikin û kincên xwe diguherînin. Ji jora otêlê, di pencerê re li kuçên Dehokê, li çiyayên hember temaşe dikim, dilê min dikele û heta ko hecî Elî Çiftçî jî ji serşokê derdikeve, dinêrim ko ji wiskiya ber xwe min du duble vexwariye jî. Em telefonekê ji Mueyed Teyib re vedikin. Serê êvarê ye em

texsiyekî digirin û jê re dibêjin bajo studioya televîzyonê.

Şofêrê texsiyê rê dernaxe. Diyar e nû dest bi evî karî kiriye. Ew bi xwe jî welê dibêje. Di rê de, li dereke kuçê serê xwe di pencerê re derdixe û ji xortekî dipirse ka ew ê çawa rê bibe ser avahiya televîzyonê. Xort li kuçê destê xwe ber hêla jor radike û dibêje:

— Hewe rast biçe, li pêş peykerê Ehmedê Xanî bifitile ser piyê çepê û ber bi jûrî hilkişe.

Û di wê gavê de çi hîs li min çênabin ku! Xwedêyo, dibêjim, me ê ev roja xweş jî bidîta! Şofêr welê dike, li pêş peykerê Ehmedê Xanî li ser aliyê çepê difitile, bi jor dikeve û em li ber studiyoyê dadikevin. Bi silav, bi hurmet û bi marîfeta dezgehên kurdî em derbasî miqamê Mueyed Teyib dibin. Em hevdu hemêz dikin, em xêr û xweşiyê li hev dikin û em rûdinin.

Di wan du rojên xwe yên pêşîn de, li Dehokê em diçine serlêdana Bingeha Laleşê, Çapxana Xebatê, Tiyatroya Mihemed Arifê Cizîrî, Yekitiya Niviskaran, Pirtûkxaneya Bedirxaniyan, Avahiya Wîlayeta Dehokê û Muzeya Dehokê... Li her dezgehekê jî ji haziran ne çêtir, em rastî maqûl û karmendên kurdan tên, ew jî bi germî xêrhatinê li me dikin, qedirê me digirin û rûmeteke kurdî didine me.

Li nava bajêr ez rastî polîs û asayişên kurd têm, silavê li wan dikim, bi wan re dipeyivim, wêneyên xwe û wan dikêşim û Xwedêyo... meriv kîjan xurtî û serbilindiyê bi wan re natamije ku! Ji Mueyed Teyib re behs dikim û jê re dibêm:

— Ne sûcekî pîs û mezin, lê min pir dixwest ko min sûcek bikira û ez pê bihatama girtin.

Mueyed Teyib dikene û dibêje:

— Ji asayişê dostekî min heye, ez ê jê re bibêjim bila bi delîl û îspat te bigirin, heta dadgeh û zîndanê jî bibin.

Di van du rojan de, li evî erdê Kurdistanê ji bilî tiştekî hertişt xweş, baş û bi hîsine miqedes in. Min got tiştek, belê, tenê tiştek... semînera Bedirxanê binxetî. Bedirxan yekî binxetî ye. Li hewşa Yekitiya Niviskaran ji me re welê danasîna wî dikin. Li Sovyetê xwendiye. Li ser pirsa kurd û dîroka wê. Ew ê semînerekê bide. Em li hewşa Yekitiya Niviskaran rûniştine, kamerayên televîzyonê dor li me digirin û Bedirxanê binxetî dest pê dike. Heta dawiyê jî bi zimanê erebî semînera xwe dide. Ji bo ko ecêb neyê û em harmoniya semînerê danexînin, ez û hecî Elî Çiftçî, em dengê xwe nakin. Lê di dawiya semînerê de reportorê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Televîzyona Kurdistanê tê, min ji beşdaran xewle dike û ji min dixwaze ko ez dîtina xwe a li ser semînerê bibêjim. Bibêjim ka li ser kurd û dîroka wê dîtinên Bedirxan çawa bûye. Ez jî li ber kamerayê disekinîm û dibêjim:

— Ez nikanim dîtinên xwe bibêjim, ji ber ko semîner bi erebî bû. Tenê ji hinek gotin û pirsên temaşevanan (wan guhdariya erebî dikirin lê pirs û dîtinên xwe bi kurdî dikirin)… belê, ji evan ez têgêhîştim ko semîner li ser çi ye. Ne dîtinên xwe, lê ez ê çend gotinan bibêjim. Û ez li pêş kamerayê dibêjim:

— Ji piçûktiya me û heta îro jî dema ko Quran tê xwendinê, ji me re digotin û hîn jî dibêjin: bêdeng guhdarî bikin. Meriv dibêje ez bi erebî nizanim û fam nakim, li meriv vedigerin û dibêjin: kelamên Xwedê ne, tiştên xweş têne gotin û tiştên xweş têne xwendinê. Îcar ez bawer im Bedirxanê binxetî jî tiştine hêja digotin û bêguman behsa tiştên xweş dikir. Lê min fam ne kir. Sê sed sal beriya niha… a ew cenabê ha (li vir ez destê xwe ber bi hêla peykerê Ehmedê Xanî bilind dikim) dibêje: ji bo ko xelk nebêjin kurmanc bêmarîfet in... radibe bi kurmancî dinivisîne. Nemaze îro û anuha li ser evî erdê miqedes dîsa bi zimanên welê semîner dibin ko tu carî me jê hez ne kiriye... û me jê fam ne kiriye.

Reportorê televîzyonê wê çaxê têdigêhîje ko em bi erebî nizanin. Belê, a ev semînera bi erebî ne tiştekî baş bû.

Û êvara wê rojê, dîsa li wê hewşê û li ser şîvê, Bedirxanê binxetî jî evan gotinên min rast dipeyitîne û heta derekê belbî jî ji xwe dişikê. Lê bi rastî jî mebesta min ne ew bû ko ew ji evî kar û kerametê xwe bişikê. Min xwest ko ez vebêjim ka ez çi hîs dikim.

Sibetirê zû, dîsa bi rêber û dîsa bi şofêrekî re em berê xwe didine çiyan. Amediye bajarekî kevin û li ser pozê girekî berwarê çiyê ava bûye. Rengê avahiya bajêr kevin û mîna kelayekê ye. Xwedê dizane fikra avahiya bajêr ew bûye ko bi asanî bajêr ji êrişên barbaran biparêze. Li pişt Amediyeyê jî çiyayekî bilind û bilind. Ji jora çiyê av tê xwarê û heta jêr diherike. Li ser devê evê avê, di navbera dar û zinaran de aşpêş, nanpêj, dikan û havîngeheke hênik... Meriv naxwaze ji wan deran rabe ser xwe. Dewlemend û şêxên ereban ji Bexdadê hatine, tev xeftanên sipî û egalên xwe yên reş li evê derê xwe dane ber hênikayiyê. Li gor rêber û şofêrê me, ev jî tûrîstê me bûne. Ne tenê dewlemendên wan, herweha koçerên ereban jî xwe li Kurdistanê girtine û hatine li ciyên bi dar, ciyên bi av û di

binê çiyan de kon vegirtine. Hukmê Kurdistanê bi pereyekî sembolîk cî dane wan. Ew jî gelekî xweş û kêfxweş li wan deran dîmînin. Wusa dibêjin. Em wê rojê li nava Amediyê digerin, em vedikişin devê avê, ava ko ji jora çiyê bi deng û bi kefeke sipî weke şîr dadikeve xwarê. Li berwarê evî çiyayî, li devê avê û ber bi jor wek ko min got: dikan, nanpêj û aşpêj heta jorê weke libên tizbiyan e. Em li binê xiyamekê rûdinin, nan û goştekî ser êgir bi dew û seleteyeke çiyayî dixwin û em bi êvarê re bi şûn de vedigerin Dehokê.

Li ser daxwaza me ya ko em dixwazin biçin seredana Laleşê û bibine hecî... Xwedê jê razî be û Xwedê xêra wî qebîl bike… Mueyed Teyib haziriya me dike. Karê me dike ku: yekî ji wan karmend û kameramanekî xwe î televîzyonê ji bo hecaciya me bi me re bişîne.

2ê mehê ye. Bi jeep û şofêrekî televîzyonê, bi kameramanekî televîzyonê û maqûlekî ji Bingeha Laleşê em berê xwe didin Laleşa miqedes. Ro li taştiyan e. Di rê de nîgara çiyayên hawurdor, dîroka wan gund û bajarokên li ser riya me, zilm û zordariya Sadam Husên, şer û berxwedana pêşmergên li hemberî vê zordariyê... yek bi yek tê behskirin. Li van deran û Xwedê dizane li tevayiyê Kurdistanê, her mit û serê her çiyayekî xwediyê destaneke şer e, her dol û her newaleke evê derê gelek xwîn kişandiye xwe û pê hevîr bûye, her kevir û her zinarekî evî erdî ji qêrîn û hewarên dayikên zarokên şîr çendik û çend caran sincirîne! Xwedê ji neheqan re nehêle!

Em xwe digêhînin karwanserayeke kevin û xalî. Kevin û bêxwedî ye. Dixwazim bibêjim dîwarên ji hêla der xirabe dixuye, giya û devî ji nava dîwarên wê derbûne û xwe bera jêr dane. Hundurê wê li ser sitûnên kevirîn e, avahiya zikê karwanserayê bi motîfên kevnare ye. Lê anuha bi kar nayê û diyar e ji mêj ve û anuha jî kesekî guh nedaye evê karwanserayê. Informatorê ji Bingeha Laleşê bi me dide zanîn û dibê:

— Di wexta xwe de ev xan, Xana heciyan bûye. Dema ji ciyên dûr xelk dihatine tewafa Laleşê, hesp û hestêrên xwe li vir vedihewandin û li vir bêhna xwe vedidan. Lê anuha bêxwedî ye. Zêde kes nayên, yên ko tên jî bi seyaran tên û di rojê de vedigerin. Pêwîstî bi vê karwanserayê ne maye.

Ew karwanseraya ko êdî pêwîstî pê ne maye, em jî jê derdikevin û em dîsa bi jeepa xwe ber bi jor dikevine rê. Bi qonaxa kişandina cixareyekê, ji dûr ve, di nava çiyayên asê de serê qubeyên Laleşa pîroz bi me ve xuya dibe. Sipî û mîna şerpikên şîr bilind ber bi Xwedê hilkişiyane. Li wir, li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ber kaniya sipî çend zarok pêrgî me tên, weke hemû zarokên vê dunyayê ew jî bi çav û awurên mereqdar in. Erdên wan çîr û kej, porên gelekên ji wan bi ser sore ve ne. Cudayiyeke ji zarokên mayî ew e ko hinekî kûvî ne. Lê kûvîtiyeke pak û pakîze. Hîsên welê li min peyda dibin ko ev zarokên pak baweriya wan bi me nîne. Belê, bi çav û bi awurên welê li me mêze dikin. Ev ne ji ber ewê yekê ye ko em ji welatekî din çûne, na... lê mîna ko em û wan ne ji hevîrê teştekê ne û tenûra ko em pêve bûne nan jî ne tenûra wan e, mîna ko em ji tiştekî din peyda bûne û loma wan bawerî bi me nîne.

Di wê gavê de nivîsa mîsyonerekî rojava dikeve bîra min. Li gor mîsyonerê rojava: bi qasî ko di bîra min de ye, Pîrê êzîdiyan jê re gotiye: Em ji hezretî Adem, lê ne ji Hewa xanimê ne. Dema ko seriyên zarokan li Adem û Hewayê dibin hejmareke heftê duduyan, a wê çaxê Abel û Kaîn radibine hev. Kaîn radihêje kevirekî mezin û pê Abel dikuje.

Li ser evê mêrkujiya cara pêşîn, Adem û Hewa li hev rûdinin, bi hev dişêwirin û bi hev re dikevine heftûheyştê. Adem dibêje ev çewtiyeke ji te bû û Hewa xanim jî dibêje: na, çi bigire ev ji ber çewtiyeke te ye ko zarok rabûn hev... De îcar ji bo ko bizanin ka ev yeka ji wan herduyan çewtiya kîjanê ye, rabûne, her yekî ava xwe kirine kwîzekî piçûk û kirine erdê. Piştî dem û germiyeke pêwîst, Adem û Hewa rabûne çûne ber wan kwîzan ko devê wan vekin û bizanin ka çi çêbûye. Pêşiyê devê kwîzê Hewayê vedikin ko çi bibînin. Ji ava Hewa xanimê kurm û kêz çêbûne. Dû re jî devê kwîzê Adem vedikin û dibînin ko zarokekî piçûk î şêrîn tê de veketiye. Adem ewî zarokî ji kwîz derdixe, navê Set lê dike û gelekî jê hez dike. Her ko Set mezin dibe, baqil û çelengtir dibe. Set dibe xort. Hewa xanim ji evê yekê dexesiyan dike, rojekê zarokên xwe yên mayî li hev dicivîne û ji wan re dibêje:

— Bala Adem î bavê we her li ser Set e, mîna ko tenê ew hebe, ew tenê lawê wî be. Bala xwe nade ser we. Werin hûn evî Setê ji ava Adem bifetisînin ko ew êdî bala xwe bide ser we.

Herweha Hewa xanim û ew heftê û du zarokên xwe yên mayî bi hev dişêwirên, gotina xwe dikin yek ko nîvê şevê rabin û biçin Set di xewê de bifetisînin. Beriya nîvê şevê û wê wexta diyar, Xwedê fermanê dide Cibraîl ko biçe yek bi yek pifî devê wan hemû heftê û du zarokên Hewa xanimê bike. Cibraîl welê dike. Piştî ko nîvê şevê dibe, zarokên Hewa xanimê radibin. Radibin ko li gor şêwra xwe û Hewa xanimê biçin Set bifetisînin. Lê tavilê hay ji xwe dibin ko her yekî ji wan bi zimanekî din

dipeyivin. Ji ber ko zimanê hevdu fam nakin herweha nikanin li hev jî bikin û biçin Set bifetisînin.

Li ser evê yeka Hewa xanimê, Xwedê melekekê ji asiman dişîne ko Adem wê ji xwe re bike jin. Adem li evê jina asimanî mêze dike û dibîne ko gelekî xweşik e, destê wî lê nagere û dide lawê xwe, dide Setê xwe î ko ew pir jê hez dike.

Li gor gotina Pîrê êzidîyan, li gor evê rîwayeta wan, êzidî ji ewî Setê lawê Adem û ji wê meleka asimanî ne.

Belê, li pêş û di nava evan zarokan de, zarokên ji Adem û perîzadeyeke asimanî, ez ji kaniya sipî du mist av davême serçavê xwe, bi taseke bafûnî jê vedixwim û dû re radibim. Bi lingên xwasî em ber bi jor hildikişin, li evî ciyê pîroz mîna ko em wan ruhên pîroz neyêşinin, em hêdî hêdî û bi lingên xwasî û gavine aramî digerin. Di deriyê tirba Şêx Hadî re em bi pêyê rastê lingê xwe davêjine hêla hundur, em diçin tewafa tirba pîroz, em sê caran bi qewl û lavayên dengdar di dorê re çerx dibin, em matînên li ser tirbê di çav û eniya xwe re didin, ji wir em diçin ser tirba Şêxûbekir, destê xwe di xirqa wî ya pîroz re didin. Dû re em dadikevin mexzena ava zemzemê, ji wir jî em mistek ava pîroz vedixwin û em derdikevin.

Di dawiya dawîn de li mêvanxaneya hewşa Laleşa pîroz em rûdinin û xwarinekê dixwin, bi du piyal çay em bêhna xwe vedidin û di evê navberê de ji berpirsiyarê wir re dibêjim:

— Ez jî diwazim bibime êzidî.

Ew bi serbilindiyeke nefspiçûkî:

— Çênabe, dibêje.

— Çima çênabe, dibêjim, ez dixwazim werime sêra xwe ya berê... ez dixwazim werime ser ola xwe ya berê.

Dîsa bi nefspiçûkî, bi pişirîn wan gotinên xwe dubare dike û dibêje:

— Çênabe.

— Çima çênabe, dibêjim, ji bo ko ez bibim êzidî çi şert û peyman hebe ez ê bikim. Ko tu bibêjî, bi tewafên heft caran be, ez ê heft caran werim tewafa Laleşa miqedes. Ko bibêjî... ez dikanim heft caran xwe bi ava Kaniya Sipî bişom û jê vexwim... Ko bibêjî... bi gotineke din, şert çi be ez ê wan şertan bi cî bînim û evê yekê jî ez ji dil dixwazim.

Ew dîsa bi wan gotinên xwe li min vedigerîne û dîsa:

— Çênabe, dibêje.

— Rê li ber min negire, ya ezîz... dibêjim, bav û kalên min bi zora devê şûran, bi hukmê gurzan bûne misilman... ma di evê yekê de min çi


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

guneh heye? Ez dixwazim vegerim ser ola xwe ya kevin. Rê li min megire!

Evê carê mîna ko hay ji giraniya berpirsiyariya xwe hebe, destê xwe jî ber bi min vedigire û dibê:

— Çênabe, be qurban… ma tu ji min dixwazî... heşa, ez guhertinan di ola êzidiyan de bikim.... Lê înşallah heta du salan Melekê Tawus ê dakeve ruyê erdê, Ew ê herkesî xelas bike û me jî pê re.

— Baş e, dibêjim, wê çaxê sozê bide min... du salên din ez ê dîsa werim tewafa evî ciyê pîroz, lê wê çaxê jî heta ko ez nebim êzidî, ez ê ji vir neçim, te got erê?

— Na, dibêje, va ye tu hatî û tu bûy hecî... dilê te pak e. Înşallah Melekê Tawus ê dakeve, Ew ê herkesî xelas bike û me jî pê re.

Herweha çênabe ko ez bibim êzîdî, lê weke hecî em ji Laleşa pîroz derdikevin. Weke hecî Hesenê Metê û hecî Elî Çiftçî. A ev rengdêra pîroz me bi evî awayî girt.

Wek ko min got, piştî wan leşgerên li ser ava Şetê Cizîrê êdî sempatiyeke min li leşger û polîsan çêbûye. Çi leşgerên ko ez li nava bajêr, li devê deriyên ciyên fermî dibînim, ji kêfxweşiya dilê xwe silavê lê dikim û bi evê yekê jî serbilind dibim. Anuha jî dema ko em ji Laleşa pîroz derdikevin, di kuçeyê de çavên min bi du cot leşger dikeve û ez dîsa silaveke serbilindiyê lê wan dikim. Ew jî bi çavine kesên wezîfedar li min dinêrin, silava min werdigirin û ber bi jeepa xwe em ji wan dibuhurin. Di wê gavê de tavilê tiştek bala min dikişîne, sîlehên di milên wan de ne weke yên me ne, dixwazim bibêjim ne weke yê leşgerên me ne. Piştî ko em êdî di rê de ne, li ser pirsa min kameremanê me bi min dide zanîn ko ew leşgerên tirkan bûne. Ji bo gerîla hati bûne vir, ew wusa dibêje. Li ser van gotinên kameramanê me, ez hinekî narihet û hinekî jî pê dêşim ko leşgerên tirkan jî hatine evî ciyê pîroz. Li Dehokê evê yekê bi me didine zanîn ko wan hay ji wan leşgeran hene û ew bi destûra wan çûne wir. Dîsa jî narihet dibim, lê ez vê yekê didim xatirê îdara siyasî, pêwendiyên du dewletên cîran û dixwazim ji bîra bikim.

Em dixwazin Zaxoya rengîn bibînin. Em li texsiyekê siwar tên û em berê xwe didin Zaxoyê. Ji dûr ve xuya dikin, dixwazim bibêjim alayên kurdî… sor, sipî û kesk. Ne tenê li devê Deriyê Îbrahîm Xelîl, li serê girên dora bajêr, li devê pireyan, li avahiyên bilind alayên kurdî pêl didin. Ko yek ji min bipirse û bibêje xisûsiyeta bajarên başûrê Kurdistanê çi ye, ez ê bibêjim, alayên kurdî ye ko Zaxoyê ji bajarên din cuda dike. Em li wê

derê li aşxaneyekê rûdinin û xwarineke xweş dixwin, em li ser Pireya Delal digerin û dû re dîsa berê xwe didine Dehokê.

Bi serê êvarê re ceremoniya dîplomên xortê universîteyê ye, universîte ji nava Dehokê der û hinekî jî dûr e. Em dixwazin beşdarî temaşeya şahiya evê ceremoniyê bibin, em dixwazin bibin xwedîparên kêfxweşiya xwendekarên xwe yên kurd. Li meydana parkeka mezin bi qasî pênc hezar temaşevan hene. Ref bi ref, li gor beşê universîteyê reng bi reng, xwendekarên unîversîteyê bi alayên beşên xwe tên û li pêşberî temaşevanan di rêza xwe de disekenin. Keç û xort, di binê alaya kurdî de, li ser erdê xwe, di hewşa zanîngeha xwe de, li pêş xelkê xwe, bi serbilindî, bi dilxweşî... Bi dilekî tenik xwe bi xwe dibêjim: »De ka çiyê me ji xelkê kêmtir e? Ka kê gotiye ko em ecemiyên evê dunyayê ne!«

Pêşiyê birêz Mesûd Barzanî li gor nefspiçûkiya axaftinên xwe yên hertimî, kurt û konkret behsa girîngiya unîversîteyê, xwendekarên nûgêhîştî, rola mamoste û profesoran dike û ji bo erdê Kurdistanê pîroziya evê rojê bi lêv dike. Dû re rektorê unîversîteyê û paşê jî li ser navê xwendekaran yekî kurmanc bi kurdiyeka paqij dipeyive.

Em ji Dehokê derdikevin. Berê me li Hewlêrê ye. Em ji Amediyê, Çemê Sîriyê, Çemê Zê dibuhurin û em derbasî Geliyê Balîndayê dibin. Ji wir û pê ve Navçeyê Barzan e. Ev navçe bi çiyayên xwe, bi dar û hêşînayiya xwe ji navçeyên din hinekî cudatir e. Şofêrê me ji me re dibêje ko li vî navçeyî hêj di dema rihmetiyê Mele Mistefa Barzanî de birîna daran weke gunehkariyekê bûye. Û aniha jî weke qanûn rast kirine ko birîna daran û nêçira kewan qedexe ye. Rêya me di jora çiyayê evî navçeyî re dibuhure. Li jora çiyê em dibînin bê ew avên çemên Sîrî û çemê Zê çawa mîna maran li newqa van çiyan digere, di xwe de diherike û diçe. Ez ji şofêr dixwazim ko em li derekê dawestin ko ez çend wêneyên xweş bikêşim. Lê şofêr bi min dide zanîn û dibêje:

— Dawestina li evan deran qedexe ye. Ko ji dûr ve pêşmerge me bibînin, ew ê bibêjin qeyê em mayîna dikine erdê. Li van deran gelek tiştên welê bûne.

Bi pirs û bi mereq jê re dibêjim:

— Kî li evan deran mayînan dikine erdê.

— Şervanên kurdên bakurî ne, dibêje û ez jî êdî naxwazim zêde dirêj bikim.

Li gundê Barzan em diçin mala... Xwedê ciyê wî kesk bike... em diçin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mala Mele Mistefa Barzanî, Barzaniyê ko ji piçûktiya me de navê cenabê wî weke navê pêxemberan bi me nas bû. Mala rihmetî ji bombeyên rejima Baasî di ser hev de hilweşiyaye û heta nuha jî welê hiştine. Weke yadîgariya cenabê wî ye… an jî îbreta marîfeta rejima Baasî ye ko nifşên nû û nifşên dahatû bibîne. Xwedê dizane ji ber herdu sedeman e ko ev mal welê hiştine. Ji wê derê jî em dixwazin biçin ser gorna rihmetî. Em diçin, piştî vexwarina çayekê em ji kepira ber mizgefta goristanê bi berpirsiyarekî re ber bi goristanê diçin. Xwedê bi rihma xwe ciyê cenabê wî kesk bike, gorneke nefspiçûk, ji axa mintîqa Barzan axeke soringî û herweha bi çend kevir û gomiyên evî navçeyî. Rêzeke ji sitrana Kazanci Bedîhê ruhayî tê bîra min: "Bir dunyaya sığmaz iken İskender, bir mezara qayile geldi..."

Gorna rihmetiyê bi navûdeng, bi evê axê û bi evan kevirên dorê qayîl e. Ez el-fatihayeke erebî û çend gotinên ji dilê xwe di ser gorna cenabê wî de dirijînim û em ji wir vedigerine aşxana mêvanxanê. Li gor berbora evî erdî em bi nan û xwarin dibin û dû re em ji wir jî derdikevin.

De îcar xweşikiya evê mîntîqa Barzan, Diyana, Geliyê Elî Begê... Xwedêyo wek ko katibên pirtûkan bi lêv dikin û dibêjin: »Li evan deran nan û av nakeve bîra merivan, li evan derina meriv bêyî Xwedê û pêxemberan jî dikanin bijîn....«* dû re jî em berê xwe didin Şeqlawayê, em dikevin rêya Selahîdînê û em berê xwe didin deşta Hewlêrê. Germeke welê li evê deştê dadikeve ser me ko heta nuha jî ez pê ne jiyame. [*Ev jî gotineka lehengên çîrokeka Hesenê Metê ye, çîroka *Panaroma*. Nefel]

Li Hewlêrê, li otêla bi navê Çarçirayê em bi cî û ode dibin. Ev jî yek ji wan moderntirîn otêlên Kurdistanê ye. Weke hertim em pêşiyê avekê li xwe dikin, em bêhna xwe digirin, em dadikevin jêr û xwarinekê dixwin. Di van çend rojên Hewlêrê de, em diçin seredana wezîrê perwerdê birêz Ebdulezîz Teyib, em Xusro Goran dibînin û li parlamentoya Kurdistanê digerin, em diçin seredana Şukur Mistefa, Dezgeha Gulanê û Sero Qadir û gelek maqûlên din.

Di van rojan de, rojekê êvar e. Em li hewşa Çarçirayê rûniştî ne. Tarî ber bi nîvê xwe diçe û saet li dor 23ê şevê ye. Ji nişka ve dengên tivingan tariya şevê didirînin û fîşek li asiman diherikin. Dilê min bi tirs lêdikeve û Xwedêyo ev ji kengî ve ye ko min dengekî wusa ne bihîstiye: »Xwedê,« dibêjim, »Tu destê xwe bidî ber van guleyan ko kurd û kesên bêguneh jê biparêzî!« Piştî pirs û bersivên mazûbanên me û piştî saetekê, em têdigêhîjin ko şerekî di navbera asayişa bajêr û tirkmenan de ye: Komela

tirkmenan xortekî kurd kişandine hundurê komela xwe û dev û poz lê xwîn kirine. Hîn jî nizanim bê çima weha bûye, lê xortê kurd jî ji avahiya wan derketiye û çûye giliyê wan bi asayişa bajêr de kiriye.

Li ser evê yekê asayişa bajêr diçin û sûcdarên tirkmen ji komela wan dixwazin, piştî ko tirkmenên di komelê de naxwazin sûcdar teslîm bikin û gotinên beradayî bi lêv dikin, a wê çaxê asayişa bajêr li wan direşînin. Encam: du kesên komela tirkmenan dimirin û çend kes jî birîndar dibin. Ji me re welê dibêjin.

Sibetira rojê, ro li ber taştiya ye, Dr. Cemşîd Heyderî tê otêla me. Qewlê me ew e ko ew me bibe dezgeha rojnamevanan û me bi hev bide naskirinê. Li ber otêlê em texsiyekê disekinînin û lê siwar dibin. Lê beriya ko texsiya me ji ciyê xwe bilive bi qasî hejmara hawariyên Mesîh, leşgerên kurd li me û texsiya me dicivin. Mîna ko ji binê erdê derkevin, ji asimanan dakevin... tew em nabînin bê ji kuderê digirin ser me jî. Devê keleşkofan di pencerên texsiyê re li ser me ne. Çente, huviye, nav, hûn kî ne, çi ne... û gelek tiştên weha di ser me de dibarin. Ji aliyekî ve kêfa min tê: herçiqas bi hêrs û bi dengekî bilind li me diqîrin jî lê ew kurdiya wan bi min şîrîn tê, hêza wan û gotinên wan di xwe de dibînim û di ber evê jîriya wan de serbilind dibim. Wek ko min got, ji aliyê din ve jî »Xwedê neke,« dibêjim, »ku gule ji devê lûlên keleşkofên wan biherike, an jî kamera me bigirin û di erdê de bidin...« Ji ber ko heta niha me leşker welê dîtine, belê tenê tirsa min ev e. Lê Dr. Cemşîd Heyderî bi destê xwe jî me nîşan dide, bi wan dide zanîn û dibêje:

— Emana mêwanî xuman e, kaka, xelçî bakur în, le Swîd dihînewa.

Lê leşgerên asayişê… bi gotina Dr. Cemşîd Heyderî, ew kakayên ha guhdarî nakin, bi hêrs destên xwe ber bi çenteyên me dirêj dikin, pirs li ser pirsê li me dibarin û diqîrin:

— Çi di çenteyan de heye, ka huviyên xwe derxin...

Ez pasaporta xwe derdixim, dirêjî yekî ji wan dikim, devê çentê xwe vedikim û nîşanî wî didim. Di ber re jî dixwazim ko Dr. Cemşîd Heyderî jî welê bike, weke min bike. Ji naçarî Dr. Cemşîd jî bi şermezarî, bi enirîn welê dike, huviya xwe derdixe û dibêje:

— Fermo, emin mamoste me le Unîversîteyî Selahedîn.

Xortê ko keleşkof di ser me re girtiye, dadide huviya Dr. Cemşîd Heyderî, lê mêze dike û pê re jî dibêje:

— E tu torkman î?

Xwedê dizane di ewê rewşê de xort tew nivîsên li ser nasnamê jî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

naxwîne. Peyva torkman bi qasî ewan, Dr. Cemşîd Heyderî jî hêrs dike, bi gotineke din evê carê jî Dr. Cemşîd Heyderî hêrs dikeve û dibêje:

— Torkmanî çî, kakî xum, bo torkman îm!

Ez jî wek yekî sadiqtirîn û tirsonektirînê qanûnan, lê bi kêf û serbilindyeke veşartî ji wan re: »Baş e, can... baş e, fermo te pas... fermo, dibêjim û ew çi dibêjin, mîna yekî ko ji hukmên hukumatan bitirse, ez jî welê dikim. Xwedê dizane beriya huviya mamostetiya Dr. Cemşîd Heyderî û hecî Elî Çiftçî, ez pasaporta xwe, tev çentê xwe didime wan û beriya wan ez ji texsiyê jî dadikevim. Lê ev yeka ha ne ji tirsa dilê xwe, ji kêfxweşiya jîriya asayişa kurd û kurdbûyînê welê dikim û ez vê yekê di xwe de hîs jî dikim. Em dadikevin û ber bi dîwarê hember diçin pêş amîrê asayişê. Piştî ko amîrê asayişê Dr. Cemşîd dibîne, doza lêborînê ji me dike û sedemê evê yekê ji me re vedibêje. Dibêje: Ji ber bûyera do êvarê û rakirina cenazeyên wan tirkmenan bûye. Em dîsa vedigerin zikê texsiya xwe.

Piştî seredana dezgeha rojnamevanan û du sê ciyên din em vedigerine otêla xwe.

Sibetira rojê ez û hecî Elî Çiftçiyê me î Anatoliya Navîn, em li erdekî kurd, li bajarekî ji wan kevintirîn bajarên dunyayê ne. Hewlêr. Evê rojê jî li ser daxwaza xwe em dixwazin bi tenê bin. Li nava bajêr, lê jêra Kela Hewlêrê, li meydanekê ez xwe xweş dikim, ez xwe vedikêşim, berepaş diçim ko tevayiyê jêra kelayê têkeve ber kamera min. Lê nabe, kamera hemûyê nahewîne û ez berepaş heta dîwarê avahiyekê vedikişim. Beriya ko bergaha kelayê di kameraya xwe de bi cî bikim, ji nişka ve yek bi milê min digire, kamerayê ji dest min digire û:

— Were, dibêje, were derkeve jûrê!

Ez pêşiyê baş tênagêhîjim çi ye, lê li jûra wê avahiyê li oda asayişê têdigêhîjim ko ew jî ji asayişê yekî sivîl bûye. Ya rastî li vir dostê min î ezîz, Mueyed Teyib dikeve bîra min ko eva henekeke wî be. Ji ber ko tiştê ko ez li wir dikim ne sûc û ne jî gunehkariyek e. Ez welê dizanim. Li Hewlêrê ye û em ji xwe re digerin, ez dixwazim wêneyekî bikêşim û hew. Lê dîsa jî ez evê yekê didim xatirê bûyera do êvarê, pê kêfa min tê û ez jî dipêm ka ev girtina min ê bi çi rengî bibe. Lê piştî silav û du sê pirsan, em ji hev fam dikin û em bi hev dizanin. Avahî, avahiya asayişê bûye, kêşana wêneyan li ber avahiya asayişê qedexe bûye. Mixabin, evê carê jî girtineke ne bi dilê min dibe. Piştî hevnasiyê em xatir û silametiyê ji wan dixwazin û ji wir derdikevin. Em derbasî hêla nava Kela Hewlêrê dibin. Li hêla hundurê

kelê çend avahiyên kevin û kerpîçî bala min dikişîne, lê zêde jî ne. Mêzekirina li evî bajarê kevin ne bi têra xwe ye. Ji bilî deriyên kelê zêde jî tiştekî kevin û girîng ne maye. Bi daxewa!

Piştî heyşt rojekî, serê sibê zû em ji Hewlêrê derdikevin, em zû derdikevin ko germ negire ser me. Em û şofêrê xwe î bi navê kek Ezîz. Berê me li rohilat, em ber bi Silêmaniyê diçin.

Di sînorê hukmê PDK û Yekitiyê de kontrol heye. Kontroleke welê ko divê meriv ji texsiyê jî dakevin. Hecî Elî Çiftçî û şofêrê me ber bi niqta kontrolê hildikişin, pasaportên me nîşanî wan didin û tên. Kontrola di navbera evan herdu hukmên kurdî de, bi şofêrê me dane zanîn ko li hêla Yekitiyê tiştek were serê me, ew ne mesûl in. Em ji ewî sînorê sînoran derbas dibin. Di navîna herdu sînoran de bi qasî hukmê tifingeke birnoyê erdekî vala heye û li ba me li Swêdê jê re dibêjin »ingemanasland«, xwe bi xwe: dêmax ev valayî jî ev e, dibêjim, ji cixara xwe yekî agir dikim û yekî jî dîsa keremî kek Ezîz dikim. Beriya ko em bikevine erdê şaîrê gewre Hecî Qadirê Koyî dîsa kontrolek. Ji Hewlêrê heta evê kontrolê min hejmart, rasterast yanzdeh caran em sekinîne û me bersiva pirsên kurt û dirêj dane.

Li evê kontrolê jî divê em tiştekî mîna vîzeyê bistînin. Karmend, berpirsiyar, dezgeh û hertiştê evî aliyê hukmê kurdî, bi gotineke din hukmê Yekitiyê... nizanim çima lê ev aliyê hukmê Yekîtiyê bi min germtir, dostanetir tê, ji hukmekî bêtir mîna ko rasterast meriv di hewşa malê de be, hîseke welê li min çêdibe. Du nobedarên devê sînor me disekinînin, bi silav û rojbaşî ji me dixwazin ko em dakevin û kaxizeke destûrê bistinin. Em dadikevin. Hênikiya sibehê hîn jî ji hukmê xwe ne ketiye û ro li taştiyan e, di devê evê riyê de bi mebesta deriyê erdekî din, karmendan kon û kepir vegirtine û navê gumrikê lê kirine. Ji karmend, leşgerên »sînor« û mifrezan hinek kes li derve li ser textan hîn jî di xew de ne. Baş diyar e ko yên di xew de nobedarên şevê bûne. Em derbasî kepirekê dibin, rengê bîstanan û bêhna xiyar û petêxan dide der. Karmendekî şêrîn, belbî jî bi pênc an jî heyşt salan ji min piçûktir li ber maseyekê ye, me dibîne, bi marîfet radibe ser xwe, rojbaşiyê li me dike, ciyekî keremî me dike û dibê:

— Beyanîtan baş... be xêr bêyn, fermoyîn… dibêje, û em pirsa hevdu dikin, em dikevin galegalan. Dû re bi min dide zanîn ko soraniya min baş e û ji me dipirse ka em xelkê kuderê ne. Bi sipasî pê didime zanîn ko ez ji ji Diyarbekirê me û ev dostê min î hecî Elî Çiftecî jî ji kurdên Anatoliya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Navîn e. Nizanim çima lê wan jî li başûr paşnavê wî bi vî awayî bi lêv dikirin. Dû re li gotinên xwe zêde dikim:

— Axir… xom soranî Diyarbekir im, dibêjim û pê didime zanîn ko bakurê nava bajarê Diyarbekir hemû bi soranî dipeyivin. Ji taxa Mêrgahmedê û berjor heta malên Seyrantepe soraniyeke baş, ji min jî baştir dipeyivin. Ez jê re welê dibêjim. Ji bo ko ji min bawer bike, ez jê dipirsim û dibêjim:

— Diyar e, xoyît Diyarbekir nedîtûwe?

Ew welê jî bawer dike. Bi mereq û dilpekiya ko ew anuha bi soranekî Diyarbekir re dipeyive destên xwe li herdu aliyan vedigire û:

— Na wulleh, nemdîtûwe, dibêje.

Piştî ko êdî fam dike ko em kî ne, ji kuderê ne, hurmeta wî bêtir dibe û ji me dipirse ka me şûtî divê an ne.

Ez pê didime zanîn ko ev erda, ev sibeha, ev bextiyariya û ev sînora... bêyî zebeş nabe. Bîne, dibêjim.

Ji me re zebeş tîne û li evê destê sibeha nêzîkî Koyê, em zebeşê xwe dixwin, weke vîze em serî heryekî me sed û pênce dînarekî didin, bi xatir û bi henek em ji wir jî derdikevin. Di derketinê de jî ez jê re nabêjim ko min henek û yariyeke diyarbekirî li te kir, ez nabêjim ko di wextekê de nêzî sê salan ez jî li evan deran di nava hêzên pêşmergan de mame û soraniya xwe ez welê fêr bûme. Na, nizanim çima, lê ez van tiştan jê re nabêjim. Bila li min bibore.

Beriya ko em di Koyê re bibuhurin ji şofêrê me dipirsim ka ew gorn an jî nîşaneka ji ciyê rihmetiyê Hecî Qadirê Koyî dizane, an ne. Em dixwazin biçin ser nîşaneke cenabê wî, ez dizanim ko gorna rihmetî li dereke Îstenbolê ye û ne li vir. Lê şofêrê me bi me dide zanîn ko ew nizane. Em derbas dibin û berî berî çiyayê Gosretê ber bi Silêmaniyê dikişin. Ber bi nîvroya wê rojê, li ser pêşniyara dostekî, em li ber derê otêla Ebû Sena dadikevin û em ji şofêrê xwe re dibêjin piştê sê rojan, sibê zû were ko em di hênikayiyê de ji vir derkevin. Me rojên xwe wusa rêz kirine.

Karmendê otêlê ji me dixwaze ko em biçin û ji asayişê kaxizekê bînin da ko odeyekê bide me. Bi me dide zanîn ko bêyî kaxiza asayişê çênabe. Hecî Elî Çiftçî dixwaze em jê re bibêjin ko em mêvanê kê ne û em kê nas dikin, dixwaze em jê re bibêjin ko em ji otêlê telefonekê ji wan re vekin ko bila ew ji xwediyê otêlê re bibêje û cî bide me. Lê ez dibêjim: “Na, evê carê em weke xelkên adî ji xwe re cî veqetînin ko em bizanin ka ev tişta çawa dibe.” Eviya ez ji hecî Elî Çiftçî re bi swêdî dibêjim. Bi gotineke din

ez dixwazim em tiştekî mîna tebdîl-î qiyafet bikin. Ji bo me jî reng û lezetek e ko em pê bizanin.

Ez vedigerime ser xwediyê otêlê û bi awayekî westiyayî dibêjimê:

— Axir ezanî çone, kaka... bi Xwa ême zor mandî bûyîne. Lem germawa wereqey asayîşî le kwêy bînîm?... çon bînimewa?...

Ew jî li min vedigerîne û dibê:

— Axir ême natiwanîn, kaka, seyarekey bîgireyn û ta cigayî asayişê biron, werqekey xoy bêynin... înca tewaw.

— Baş e, dibêjim.

Em valîzê xwe li wir dihêlin. Em dadikevin pêş otêlê, em seyarekey xo weregirên û em pê didin zanîn ko me bibe asayişê. Şofêr me ber bi wir dibe, em di rê de bi wî re dikevin galegalê û em serwextî hev dibin. Ez ji Diyarbekirê, dostê min jî ji kurdên Anatoliya Navîn û wek ko şaîr jî dibêje: Lêre jî Silêmanî ye. Belê li Silêmaniyê, li ber derê asayişê şofêr naxwaze peran ji me werbigire.

— Êwe mêwanî xuman e, emin parey le êwe wernagirim!

Şofêr sond dixwe ko çênabe ew peran ji me bigire, em mêvanên wî ne. Ew wusa dibêje. De îcar perê texsiyê jî... li Kurdistanê: nava bajarên Dehok, Hewlêr û Silêmanîyê pênc dînar e. Ez bi sond û bi zorê bîst dînaran di destê wî de datînim. Em bi sipasî xatir jê dixwazin û em dadikevin ber deriyê asayişê. Hewşeke fere ye, weke garnîzoneke mezin e. Hemî jî kincên leşgeran li wan e. Em ji avahiyekê derbasî yeke din û ji çaviyekê derbasî yeke din dibin. Bi silav, bi kêfxweşî ew çi ji me dipirsin, çi ji me dixwazin em jî hemûyî bi awayekî rast û vekirî dibêjin. Rasterast wek hevwelatiyekî qenc. Li tu ciyekî din, li hemberî dezgehên fermî û eskerî, weke yekî ji xelkê heta nuha jî min welê rast, welê vekirî û bêyî hîsên dudilî tişt ne gotiye. Bi gotineke din, heta nuha li ciyên welê û di rewşên welê de min hinek tiştên xwe çewt û bi awayekî veşartî gotiye, di hinek rewşan de min çewt ne goti be û derew ne kiribe jî min bi tirs gotiye: Nav û paşnav, navê dê û bav, ciyê ko ez jê me, ciyê ko ez lê me, ez ê çi bikim, çi difikirim... Lê ez bala xwe didimê ko li evê derê pêwîstiya min ji gotinên çewt, Xwedê neke para kesekî û heşayî we… pêwîstiya min ji derewan tuneye, gelek rihet û serbilind dibêjim. Evêya ez li vir hîs dikim û ez bi lezeta rastgotinê dihesim. Ez pê dihesim ko meriv çiqas rihet e dema ko dudilî li meriv tune be.

Vir dibêjim, qest û mebesta min li herdu aliyan jî welê ye, lê li hêla Partiyê rewşa me dest ne da ko em wek xelkên normal bidin û bistînin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li hêla Partiyê, li her deverê em weke fermî û nîvfermî bûn loma îmkaneke welê ne ket destê me ko em dakevin deriyê asayişê û wekî anuha bikin.

Em ji avahiyên asayişê derdikevin, em dîsa li texsiyekê siwar tên û em tên ber otêla Ebû Sena. Em odeyekî vediqetînin û derdikevin jor. Li jor em avekê li xwe dikin û telefonê ji resepsiyona otêlê re vedikin ko ji me re xeta hejmarekê veke. Ew xetê ji me re vedikin û ez jî li birêz Mulazim Emer digerim. Yek derdikeve û dibêje:

— Êsta le êra niye, kaka, cebabit?

Ez cenabê xwe jê re dibêjim û ez bi yeka din re dipeyivim. Dû re em dadikevin jêr, li salona rûdinin û li bendî ne. Piştî nîv saetekê em dinêrin ko pêşiyê texsiyeke reş disekine, texsiya asayîşa imûmî ye. Du kesên bi sîleh dikevine hundur, li pişt wan jî Xecê Xan. Mêvan û personelên otêlê bi hatina wê re bi giramgîrî radibin ser lingan. Ez bawer im di wê gavê de karmendên otêlê fikirîn ko wan çima ji bo wereqa asayişê em heta asayişê şandin. Dû re jî di wan sê rojan de her cara ko em bi tenê jî dihatin otêlê, ew personelên wir bi giramgîrî ji ber me jî radibûn, herwekî ko em merivine mezin bin.

Li Silêmaniyê, em diçin serlêdana dezgeha Gelawêjê, em diçin seredana rojname û Televîzyona Xakê. Hêro Xanim xêrhatineke germ û dostane li me dike, ode bi ode, studiyoya televîzyonê, kar û programên ko çawa amade dibin, yek bi yek ji me re bi kêfxweşî behs dike, dû re bi ken li gotinên xwe zêde dike û dibêje îmkanên me ev in. Di wan rojan de Mam Celal Talabanî ne li Kurdistanê ye.

Di van sê rojên xwe yên li Silêmaniyê, ez û hecî Elî Çiftçî, em carekê bi tena serê xwe derdikevine bajêr. Li Silêmaniyê dema ko ro ji taştiyan dişikê û ber bi nîvro bilind dibe, ji germê meriv nikane li derve bisekine. Nemaze kesên mîna me, kesên ko hînî germeka welê ne bûne. A wê çaxê jî ji bilî caris û xwedîkaran herkes vedikişin ciyê hênik. Em li Silêmaniyê li nava bajêr in. Hecî Elî Çiftçî dixwaze em biçin otêla xwe, em vekişin hênikayiyê. Lê ez wek carisekî dibêjim na. Xwedê dizane di tevayiya rêwîtiya me de, tenê ev tişta ye ko ez û hogirê xwe î rê, hecî Elî Çiftçî, me li ser li hev ne kiriye: Ez dixwazim biçim li Baxê Giştî li binê daran xwe bavêjime erdê û bixewim. Ew jî dixwaze em biçin otêlê.

— Baş e, dibêjim, tu biçe li otêlê rakeve, ez ê jî biçim Baxê Giştî. Saet li şeşê êvarê em li ber peykerê Yilmaz Guney hevdu bibînin.

Em welê li hev dikin û ez berê xwe didim nava darên Baxê Giştî. Yek bi

yek diçim û dîsa li wan hemî peykerên ezîz û hunermendan dinêrim, ji bo paldayînê, binê darekê ji xwe re hildibijêrim, li erdê, li ser piştê xwe dirêj dikim, şekalên xwe didime binê serê xwe, cixareyekê agir dikim, hêdî hêdî bi serbilindî dûyê wê ber bi Xwedê pif dikim û dikevime ramanan. Xwedêyo dibêjim, erd, dar, sî û ev asimanê ko anuha di ser min re ye... belê ew jî êdî asimanê me kurdan e. Çi tiştekî xweş e! Di vê xweşiyê de, di kelekela germa Silêmaniyê de li binê darên Baxê Gişt bi nîv saetekê beriya wexta xwe şiyar dibim. Na, min şiyar dikin, ji dengê zarokan şiyar dibim, zarokên ko bermotê difroşin. Bi çend gavan ji min dûr du zarok heryekî sandoqek di milên wan de li min û hawurdorê dinêrin. Li dor salên deh û yanzdehan e. Ez radibim ser xwe, rûdinim, xwîna min li wan dikele û ji wan re dibêm:

— Tahal werek, şitexlek erebî?

Bêyî ko bizanim ka ev erebiya min rast e an ne, dixwazim ji wan re bibêjim: Hûn bi erebî dizanin? Zarok li hev dinêrin û yek ji wan ji yê din re dibê:

— Çî elê?

Ez dîsa deng li wan dikim û dibêm.

— Baş e êwe bi kurdî ezanin?

Yekî ji wan dibê:

— Ballê.

— Baş e, êwe çî efroşin?

— Çilûre...

Em li hev dikin, ez hinekî din jî bi wan re dipeyivim, li saeta xwe mêze dikim, radibim ber bi peykerê Yilmaz Guney û diçim. Hecî Elî Çiftçiyê Anatoliya Navînî di wexta xwe de hatiye.

Li Silêmaniyê serê wê êvarê em berê xwe didin Mizgefta Gewre û li wir bi destmêj em diçin ser gorna Şêx Mahmûdê Berzencî. Seydayek û çend xortên din jî di mekanê Şêx de ne. Piştî silaveke Xwedê, ez destê xwe vedigirim, di dewsa fatîheyeke erebî de ez dîsa gotinên di dilê xwe de jê re dibêjim: »Şêxê min, ez nizanim sewta dengbêj gêhîşte cenabê te an ne. Sewta ko li pey cenabê te bilind dibe û dibêje: »Hawara tirkan dûr e kurd xayîn e, Şêxê min!«* [Straneka Kawîs Axayî ye ko li ser Şêx Mehmûdê Berzencî hatiye gotin, Nefel] Lê ez ji cenabê te re vebêjim... îro... piştî ewqas wext, îro jî ew hawara tirkan li me bûye agir û ferman û... û kurd jî hîn wekî xwe ne, Şêxê min!

Em sê roj û sê şevan li Silêmaniyê dimînin. Lê ji wan hersê şevên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Silêmaniyê em du şevan li Serçinarê dibin mêvanên maqûlan: Şêrko Bêkes, Mulazim Emer û Xecê Xanê.

Şeva sisiyan Xecê Xan li gel parêzgerên xwe tê û me bi xwe re dibe mêvandariya malekê, malake ededî. Ji rengên sivîliya ehlên bajarê Silêmaniyê belbî jî rengekî herî xweş seredana evê malê ye, ji bo min. Weke malmezinên ji eşîra Baban, em bi nan û şîv, bi qedir û rûmet dibin. Derengî şevê ye, em ji wê malê derdikevin, me hinekî jî vexwariye, kêfxweşî û serxweşiya Xecê Xanê li nav hev ketiye, fermanê dide şofêrê xwe û dibê: "Ba biroyn Ezmîn." Berê me li derveyî bajêr e, saet li yek û nîvê şevê ye, nîşana qurxa meha 8an li ber zê ye. Xecê Xan dikene, distirê, tiştên dûr û nêzî aqilan dibêje û şofêrê wê ber bi tariya çiyayên jor dajo. Di niqtên kontrolan de texsiya me giran dibe, lê li nuxteyan nasekine. Bi silav û bi îşaret jê dibuhure. Em hildikişin Ezmînê. Li wir li evê saeta duduyê şevê Silêmanî dişewute, weke teşteke mezin ko te agir tê de daniye, ji lambeyan dişewite. Mîna ko kêfxweşî û serxweşiya Xecê Xanê têr neke, kewkeliya şaîriyê jî davêje ser ruhê wê û ji Hacî Qadirê Koyî helbestekê dibêje. Li ser Silêmaniyê ye.

Serê sibê zû em ji Silêmaniyê derdikevin. Şofêrê me dîsa ew ê berê ye. Ew ê ko em ji Hewlêrê hanîn. Bi navê Ezîz e. Dema ko em ji Silêmaniyê derdikevin, li derveyî bajêr li gor rêdara îdarî divê xwediyê texsî û kamyonan baca rê bidin. Em disekinin, karmendên baca rê tên ber şofêrê me û şêst dînarî jê dixwazin. Lê kek Ezîz bi wan dide zanîn ko em mêvanê televîzyonê ne, ew ê me heta Koyê bibe û bi şûn de vegerîne. Di wê gavê de dilê min ji Ezîz î şofêrê me li hev dikeve û dikim ko li ba wan karmendan jê re bibêjim: "Tu derewan dikî, em naçin û venagerin…" lê ez evan gotinan nabêjim. Û Xwedê dizane ji bo ko şermezarî çênebe, ez evê yekê nakim. Ezîz pênc dînarekî dirêjî karmend dike û bi rê dikeve. Ez bêtir ditengijim û êdî cixara xwe bi tenê dikêşim. Beriya evê bûyerê her cara ko pakêtê ji bêrîka xwe derdixim, qedirê wî digirim û cixara pêşîn îkramê wî dikim. Lê piştî vê bûyerê, na, ez nakim. Dixwazim bizane ko ez ji çewtiya wî tengijîme. Lê kek Ezîz tênagêhîje, an jî ez welê têderdixim. Loma dû re jî ez xwe nagirim û dibêjime wî:

— Erê tu Xwa bo wa ekî, ka Ezîz, bo dilêy ke ême ta Koyî eron o diwayî bo Silêmanî digerinewa?

Kek Ezîz di neynikê de li min dinêre, lê gotin jê nayê der. Ez dibêjim:

— Axir çênabe ke ême weku kurd karmendên xoman bîxapînin, diroyan li ewan bikeyn. Ezanî çone. Ko emana mamûrî Sedam an tirk beyn...

balam zor şitekî naxoş e eger ême rabîn bo mamûrî xoman diroyan bikeyn, têegêy?

Ez nizanim têdigêhîje an ne, lê Ezîzê şofêrê me dengê xwe nake. Tenê li min dinêre û ez ji awurên wî têderdixim. Têderdixim ko anuha dibêje: ev ajanê Mam Celal e.

Di rê de li nêzîkî Hewlêrê li milê çepê daran diçînin. Ez pir dixwazim ko ez ji kak Ezîz re bibêjim raweste, raweste ko weke xêr û bîranîn ez jî biçim û çend daran daynim. Lê ji ber vê bûyerê, dilê min jê dimîne û ji bo evî karê pîroz jî jê re nabêjim bisekine. Di tevayiyê gera me de tenê ji evê bûyerê bi vî rengî narihet dibim. Û em xwe digêhînin Hewlêrê.

Li otêlê em dibîhizin ko Muayed Teyib ji bo seredana me û birêz Mesûd Barzanî wext veqetandiye. Zû bi zû em bi aveke Hewlêrê toza Silêmaniyê ji xwe paqij dikin, em kincên xwe diguherînin, em bi texsiya fermî û bi Mueyed Teyib re berê xwe didin Selahedînê, palatsa presîdentiyê.

Piştî çend derî û parêzgeriya wan, em bi texsiyê derbasî hewşa palatsê dibin. Em hildikşin jor û li salona jora palatsê. Cenebê Mesûd Barzanî pêrgî me tê, destê me digire, xêrhatineke germ li me dike, ji presîdentiyê bêtir, bi marîfeteke mîr û kurmancên berê dide pêşiya me û em diçin jora meqamê wî. Li jora meqamê xwe jî li gor marîfetê em li hêla jor in û ew jî li kêleka me ye. Bi gotineke din dîwana wî li gor jora odê li kêlekê ye û dîwança mêvanan jî li jorê dikeve. Eviya jî ez didim xatirê marîfeta meziniya mezinên kurdan. Û dîsa bi rengekî germ xêrhatinê li me dike, li rewş û rihetiya me dipirse.

Bi qasî 45 deqeyekî em li ba cenabê wî rûdinin û bêyî ko em têkevin gotinên siyasî, em dipeyivin. Pirsa gera me dike, ji me dipirse ka me rewş çawa dîtiye. Ez jî li ser navê xwe pê didime zanîn û dibêjimê: »Kî ji bo silametiya Kurdistanê du keviran bide ser hev, li ser nefsa xwe bibêjim, bi yekî wek min jî dikeve ko were û wan keviran tewaf bike.« Dû re em li ser televîzyonê û latîniya kurmancî dipeyivin: Dîsa li ser nefsa xwe pê didim zanîn ko em kurdên hêla bakur û ew hemî kurdên ko bi pîtên erebî nizanin... ew ê nikani bin weke nivîsên pîtên erebî televîzyonê temaşe bikin. Ew jî bi awayekî germ nêzîkiyê li evê mijara kurmanciya bi latînî dike û dibê: »Ew karê zimanzanan e, em pê kêfxweş dibin ko karê xwe bikin û têkin xizmeta gelê xwe. Em kêfxweş in ko anuha me kitêbxaneyeke bi navê Mala Bedirxaniyan heye ko bingehê latîniya kirmanciyê danîne.«

Ez nizanim çawa dibe, lê dû re Mueyed Teyib gotinê vedike û tîne ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bûyera min a ser avê. Ew ji cenabê Mesûd Barzanî daxwaz dike ko guhdarî bike bê ez çawa ji avê derbas bûme. Ji naçarî ez jî êdî behsa ewê bûyera xwe û ser avê dikim. Ji cenabê Mesûd Barzanî re:

»Li ba me û ez welê bawer im di tevayiyê kurmanciyê de jî welê ye… Di kurmanciyê de ne minasib e ko av bi çavên mêran bikeve.« dibêjim û wê bûyera xwe ya li ser devê Şetê Cizîrê behs dikim, bûyera ko êdî xwendevan jî pê dizane. Lê bala min dikişîne ko di dawiya vegotina evê bûyera min de çavên wî jî tije dibin. Ez wer bawer dikim, ji bo ko ez zêde li xwe negirim: »Na, mêr jî digirîn, lê ne ji bo wan tiştên ko jin ji bo digirîn.« dibêje û ji me re behsa axaftina xwe ya pêşîn û parlamentoya Kurdistanê dike. Behs dike ko di civîna pêşîn de, li pêş hemî palamenterên kurd di parlamentoyê de dilê wî rê ne daye wî ko axaftina xwe heta dawiyê xelas bike. Ji min re dibêje ko belbî ew ji min jî xirabtir bûye. Evê hîsa wî ez gelekî baş têdigêhîjim. Piştî 45 deqeyan û evê hevdîtina me ya sade, germ û dostane bi destûr em ji ba cenabê Mesûd Barzanî radibin. Di rabûnê de ew dîsa dide pêşiya me heta salona jor bi me re derdikeve, li wir jî dîsa bi germî û bi dostanî destê me digire, sitara Xwedê li me dike û em ji wir dadikevin aşxana palatsê.

Ko ez li xwe mikûr werim û cenabê Mesûd Barzaniyê vê kurtedemê vebêjim, ji presîdentekî bêtir mîna dost, mîna bira û mîna mezinekî ji malê, bi marîfeteke kurd û kurmanciyê... bi min welê hat. Eva jî ew tiştên ko min ji dûr û nêzîk ve pê dizanî û dipa, jê gelekî zêdetir bû.

Li aşxana palatsê bi qedr û rûmet em firawînê dixwin. Li pêş min jî kek Sîdat rûniştiye. Ez pêşiyê nizanim bê kî ye, lê gelekî bala min dikişîne. Meriv dibêje qeyê hîkmeta Xwedê, cenabê Mele Mistefayê Barzanî ji gornê derxistiye an jî ji asimanan daxistiye, bi qasî 50î salî ciwan kiriye û daniye evê derê. Dirûvên wî gelekî li gorbihiştê mezin dima. Bi kêf, bi henek em bi wan kesên palatsê re nan dixwin. Piştî firavînê em ji wan jî xatir dixwazin û li ser nefsa xwe dibêjim, bi hîsine gelekî tevlihev û serbilind em ji wê derê dîsa ber bi otêla Çarçirayê tên.

Sibetirê em vedigerine Dehokê. Em wan dost û nasên xwe yên kevin dibînin, em xatir ji wan dixwazin û em dîsa berê xwe didine Şetê Cizîrê. Şetê ko em ê dîsa bi kelekê lêkevin û derbasî hêla rojava bibin. Em welê dikin. Em karûbarên xwe yên brokratîk li deriyê gumrukê diqedînin. Em dadikevin devê şetê Cizîrê. Dema ku em digêhîjin nava avê, li pişt xwe mêze dikim û di dilê xwe de dibêjim: "Xwedê zarokên gelê kurd û wan

hemû kesên bêguneh ji xirabiyan biparêze." Em derbas dibin û diçin li Qamîşloyê li ber otêlekê disekinin. Her çiqas ne bi dilê kurdên me yên binxetê ye jî, em welê dixwazin û em bi alîkariya Konê Reş ji xwe re odeyekê vediqetînin. Xwediyê otêlê pîremêrekî bi sal e, odeyeke kêleka oda me nîşan dide û bi erebî dibêje gelek salan ji mala Cemîl Paşa Dr. Qasimê Muxdat di evê odeyê de ma.

Sibetirê em bi otbusekê berê xwe didin Helebê. Li wir jî em gelek kesên bi qedir û bi rûmet dibînin û derengî şevê em berê xwe didin Şama Şerîf. Em diçin otêlekê, em li wir xwe bi cî dikin û dest bi karê derketina xwe ya ji Suriyê dikin. Me du roj hene. Di wan du rojan de em li gelek ciyên Şamê digerin.

Li ser tirba Selahedînî Eyubî, dikevim ramanan bêyî ko hecî Elî Çiftçi bi xwe bihesînim, di dilê xwe de: »Ya Siltanê kurdan,« dibêjim: »Em çûn û va ye em hatin jî. Mizgîniya me li cenabê te. Marîfeta îdara erd û dewletekê li ba me kurdan ne kêmî xelkê ye… xelkên ko pêxember derxistin û xelîfe bi dû xwe xistin, em ji wan ne kêmtir in. Ez bi navê te sond dixwim ko em ji wan ne kêmtir in, ya Siltan!«

Min xwest ez ji bo gorn û ruhê Siltan hinek tiştên din bi lêv bikim, lê min ne got, min got bila ji devê min nebihîse, min got ew ê aniha ji gorna xwe rabe û dîsa bibêje: "Xwe di ser xelkê re megirin!" ew ê bibêje: "Gotinên welê bi me kurdan nakeve." Bi gotineke din min dikir ko ez li ser tirba wî bibêjim: »Ev nimûnên weha jî dide zanîn ko kurd pir jîr in, jîr in ko zû bi medeniyeta nû rabin û xwe adapteyî pêşveçûnê bikin. Li ser vê yekê kurd ji tirk, ereb û eceman pir û pir bilindtir in.« [Edward William Charles Noel, Nefel]

Lê wek ko min got, ez van gotinên xwe ji kêla cenabê wî re nabêjim. Û diyar e ev yeka ha ne tenê îro welê ye, do jî her welê bûye. Bi gotineke din, kurd ji xelkê ne kêmtir bûne.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM